# DENGÊ KURD

24 pûşper 2713 k 15-7-2013 z DENGê KURD -hjmar (12) www. Pdksp.com


# Li Amûdê gel kiryara (pyd)ê Riswa dike

## Rûberûbûn

Rû yeke ji endamên laşê Mirove , rû çêtirîn û baştirîn endame di Qelafetê Mirov de ji ber ko hemû hest û hizir li ser rûdêmên wî bellû û be-lavdibin , ji ber ko hemû hêvî û awatên pêşbîninyan li ser anî û cênêk û Rexêzan xwe didin nîşandan.. Lê di warê Siyaset û Tevgera Siyasî de Rû li Rû himberî hev tên rawestan û lêknerîn li Rûberûbûna Siyasî hemû hizr û nerînên ciyawaz têne bi kar anîn , Rûberûna Bîrûboçonan serî dikşîne bê Şerim û fihêt ji ber ko Siyaset Gorepana navtêdanê ye . Lê li warê têkçûna bîrûboçûnan Rûberûbûna Şerûpêkdana Çekdarî dadkeve Gorepana pêşêlkirina Mirovayetî yê û wisa em di çin hevkoştinê. Rûberûbûn nîşana hevsengiya mezindegîriyê ye .

Dengê Kurd





2 « Rewşa Sûrya yê - Nerînek cuda (2) .

3 « Jiyana Kurd Li Rojavayê Kurdistanê .

3 « Peymangeha Pakrewan Nesredîn Korbend Gerand.

3 « Konfiransa Yekemîn ya Hunermendan lidarket .

# li Amûdê gel kiryara ( pyd )ê riswa dika

**Bazê Hisça**



Çima Amûdê ? çima destdirêjî bi berû Amûdê ve ? Pirsiyareke balkêşe û mafgîre di çarçûve yê Şoreş û cenga li dar de li seranserî Sûrya yê bi giştî û li Rojavayê Kurdistanê bi taybetî, Çimkî komerîşkên (ypg) ê gelek destdirêjî û êrîş kirine û birine ser gelek bajar û bajerok û Gundên Kurdistanê, û diser ko gelek Qurbanî hatine ketin û dan û pêdan lê Amûdê taybetnaziyeke xwey Dîrokî heye çimkî gelek bûyer û Qewman û Çivanekên evî Bajarî hene bi dirêjahiya dîroka Kurdî li Rojavayê Kurdistanê, wekû daxistina balafira firensî di toşê de li sala 1937 û lehengiya Mihemed Axayê Deqorî di Şewtana Sînemayê de paşî rizgarkirina Zarokan û Qurbaniya wî di pênava wan de lê Çivaneka dîrokî ya herî mezin ewbû dema ko Şoreşegrên Genc yên Amûdê di Raperîna sala 2004 Pekyerê Hafiz Esed anîne xwarê û ew pellixandin wê gavê rijêmê gelekî hilêb û saw girtin û vegirtin ji Amûdê û wisa Amûdê bû hêma û pêwerê Şoreş û bergîrî yê li Rojavayê Kurdistanê li damûdezgehên ewlekariya Rijêma Esed . Paşî berpabûna Şoreşa Sûrya yê li buhara sala 2011 an de Amûdê yekem Bajarbû ji bajarên Rojavaê Kirdistanê ko derbasî gorepana Şoreşê bi bû û wisa livlivîna Şoreşgêrî di nav de zor gûr û gurîx bû û hevrêzên Gencan li Amûdê berî her hevrêzan li dar ketin diser ko gelek ji ewan Çalekvanan hatin destgîrkirin lê hilorbûna Şoreşgêrî yê daneket û pîzotên livlivînê gûrtir bûn heta ko Amûdê bûye nîşana li pêçûnê û wisa rijêmê biryar da ko damûdezgehên xwey ewlekarî yê û kargêranê vekşîne ji deverên Kurdî û bide dest (pyd)ê û wê gavê qayilbûn û qîmethatinek wan ket nava tevger û gelê Kurd ji ber ko ev kirdûkoş wek mizgînîyekê bû ko desthelat ket bin zefta hêzek Kurdewar. Lê mixabin roj bi roj evî alîgirê Kurd binav karûakarên kirêt û navno bi kar Anîn û wisa kiryarên tiriskarî û serkutkarî bi cih anîn dijî alîgirên tevgerê û çalekvanên Hevrêzên Gencan û wisa roj bi roj (pyd)ê û çêllîkên xwe tekezkir ko bûye xulamok û zilamukên rijêmê heta ko kuştarên Efrînê û Kobanê lê ya herî mezin û çavbeloq bûyer û qewmana Amûdê bû , Amûdê hate armanckêşan ji ber ko paytexta livlivîna Şoreşgêrîyê bû û xwedana çevanekên dîrokê bû dêmekî bûye hêmayê Qurbanî û guloka Pêşrewxwazî yê û wisa li Alî yê dîtir û di encamê de (pyd)ê rûreşî bi dest ve anî.

# Rewşa Sûrya yê û .. nêrînek cuda (2)

**Kirmancê Çalî**

Berî ya destpêka şoreşê gelê me weha texmîn di kir ku partî yên kurd di hêla neteweyî de hev amancin .
Lê dema nêzîk bûna serkeftinê u deverdarbûna PYD ê her tişt berovajî ket hole , yanî xwesepînî u zordestî bi kar xistin ji bo ku tenê xwe cêgîr bikin , her tiştê ku niha jî l deverên kurdistanî li surî yê di qewimin jî alî yek jê siyaseta PYD ê cê di gire , yanî pilaneke wê têde heye .
Erê ev rewşa aloz di xizmeta gel u welatê me deye ?.
Erê bi wî renge xebata şaş dê gelême li rojava bi gehe kiyanek serbixwe a wek herema başur ?.
Erê bi vî renge xebatê di Karin civakek sivîl u demukrat ava bikin?.
Ev ew pirsin ku di mejî yê her kurdekî de di zivirin , her kurdek jib o bersivên van pirsan gîrode u şepilî ye .Weke diyar PYD e , alîgirekê esed u rijêma surî ye , lê di dîtina min de karekterek serekî yê cê bi cê kar ê siyaset u pîlanîn mîta tirkî yê ye , ji bo bi bazar kirina petrol keftî di destê wan de.
Ev jî çavgirêdaneka gelê meye di rabûn u xebata berev xweserî çona rojava yê kurdistanê .
Weke di ragihandinên partî u kesêtî yên siyasî an jî serbixwe da di bîsim destê mafia yî hene di rêveberî ya rojava a di destê PYD ê .
Erê çawa ew dest keft nav têkuşîna gelê me ku bi bawerdarî yek polayîn keç u xurtên kurd li parçetên dîtir ên welatê min xwe di da kuştin , çê bû?.
Ev ew pirsin ku di be gel bersivê bide , gel biryarê jib o bide , gel têbikuşe ku dewletdarî ya xwe çawa rêk bixe u xweserî ya xwe bi dest bêxe.



www.arsivakurdi.org

# Jiyana Kurdê Rojava



Ehmed lewend

Piştî derbasbûna sê sal li ser şoreşa sûrî, milet ketye rewşeke zor xerab û ta îro ne artêşa azad û ne rjêma sûrî kesî ni karye yê dî tunekê, lê delîv hatye ji kurdare go mala xwe raxin û hin qezinc bi dest xwe bixin, lê belê ta vê gavê milet ji karê tê kirin ne razye ji çi layenî ve bê û metirsîn ji alyê milet ve heye û rewş tarîye ne zelale .

Ne aramî di herêma kurdê roj ava de roj bi roj rewş ne xweş dibe û ne aramî zêdetir dibe û alozyên jiyanê zêdetir û zehmet dibin ji ber gelek sedem hene û ji wan astengan rewşa milet ya rojane di alyê kar û xebata rojane de ne maye ji ber cihê wan kesên çûne kurdistan başûr hatye dagirtin ji wa kesên bazdaî ji herêmê erebê Dêra zorê û wa herêmên din û di alyê xwendinêde dibîstan bûne cihê penabera û di alyê çûn û hatinê de metirsîn gelek hene û di alyê awlekaryê de jiyan bi zor derbas dibe û di alyê derevî de pere nînin û xwarin gelek giran û buhaye û di alyê tendurstyê de nojdar nemane hemo derketine ji dervî welat û pêre derman nînin û di alyê zarokade şîrê zaroka nîne û di alyê elektirîkê de tê birîn û ti karê bêjê nîne û pêre av jî tê birîn, di alyê gazê de nîne wek demê berê xwarin tê pijandin li ser tivkê heger ku xwarin hebê û nan gelek kême û gelek bihabûye û gelek nexwşî peyda dibin bi derketina kêzik û pêşî û tûpişk miletê kurd ketya nav bera kesên tûnderew û artêşa azad û nan xwarên rêjîmê û hêzên yê dibêjin yekînên paristina gel û asayîşa kurda û her yek ji wa serê werîs bi ser xwe de didê, û li ser hemo tişta kurd ne yekin û tar û marin.



# Peymangeha Pakrewan Nesredîn korbend gerand

Hozan Ehmed

Di mijara belav kirina bawernameyên asta seretayî ji fêrkirina zimanê kurdî ,peymangeha pakrewan Nesredîn û bi amedebûna 250 şagrtî ji gundên Abrê,Girkêxelo,Erebşeû tokil li gundê Erebşe bawername li van şagirtan belav kir , di destpêka vê helkftê de amedebûyan xulekeke bê deng rawestî man li ser giyanê pakrewanên şoreşa sûrî û pakrewanên kurdistanê nexasim pakrewanê komkujiya Amûdê û pakrewanê gotina rastiyê Nesredîn Birhik û li ser giyanê bavê netewe kurdî Barzanî yê nemir piştire mamosta fêsel Qasim gotina mamoteya xwend û tê de pîrozbahiya şagirtan kir û daxwaza serkftinê ji wan re xwest Herweha mamosta şêx Ebid Elqadir gotina rêxistina partiya Dîmuqrata Kurd li sûrî (Alpartî) xwend wî jî di gotina xwede pîrozbahiya şagirtan kir û da xuyakirin ku Alparî piştgiriya fêrkirina zimanê kurdî dike û wê vê piştgirîyê berdewam ke.

Ji layê dîn ve gotina encûmena gundê Erebşe yê ku girêdayî bi ENKS ji layê mamosta Osman Fetah ve hate xwendin û tê de da xuyakirin giringiya fêkirina zimanê kurdî û pêwestiya wê di vê qonaxê de.


Gotina rêveberiya Peymangeha Pakrewan Nesredîn ji layê mamosta Hozan Ehmed hate xwendin û tê de soz da kû Peymangeha Pakrewan Nesredîn berdewame di mijara fêrkirina zimanê kurdî û jimara derçûwan di herêma karê peymangehê de daxuyakirin û hêviya serkftinê ji şagiran re xwest.

Di dawî de bawername belavbûn li ser şagirtan û wan spasiya pemangehê û mamosteyên xwe kirin.

# Hunermendên Rojavayê Kurdistanê li hev civiyan

Dendê Kurd

Li Roja 4 /7/2013 li hewlêra paytext Konfiransê yekemîn yê hunermedên Rojavayê Kurdistanê li darket bo pekanîna sendîkayeke Hunerxwazî û pîşesazî da ko girngyê bide karûbarên Hunermendan û çalakiyên wan serrast bike û wisa ew konfirans di keşûseqayekî birayane û berpirisyane birêve çiw, û çend biryarên peywendîdar û pabend bi giyan û naveroka rewş û livlivîna rewşa lidar li Rojavayê Kurdistanê sitened



Mahmûd Ezîz Şakir

- pevxistne Komîteyeka karlidar û pabend bi karûbarên Hunera Şoreşgêrî û damezranda sindoqeke daray pabend bi karûbarên hunermenda û birvekirine çalakiyên hunerî û damezrandina Orkistrayeke sirûdxazî bo handana livlivîne şoreşgîrî li rojavayê Kurdistanê li dûmahîkê damezrandina Sendîkaye bi Serokatiya hunermendê navdar (Mahmûd Ezîz Şakir) hat bi serxistin, hêjayê gotinêye ev Konfirans hate Palpiştkirine herdû berêzan (ibrahîm Paşayê milî , Hesen Şingalî) û bi serperştiya kargêrane perêzan (Ebdulqadir Mihemed Elî , Loloxan) û komîteye rêkxistkar hatibû pevxistin ji bal herdû gencên çalekvan (Cegerxîn Hesen , Cemşîd Mihemed Elî ).



# Rojek Xweş

Mîdya Hisên – Şêran

----------------------------

Neçedûr û min pir nexapîne
Dilê minî geşne çilmisîne
Çavê min bi şewq megrîne
Ramanên min bes mewestîne
Qadê me bixwinê xemlandîne
Yekji me welat û nesredîne
Xwina şehîd hîn nekerisîne
Bi birîna xwe dinivisîne
Em gîş partîne û berzanîne
Bi hev re li bende vê rojêne
Bi raman û awaz û pryvan
û bi dengekî em fîdayîne
Rojek xweş çardeyê cehzerane
îro cejine li me kurdane
Berdilê min tacek şahciwane
De pîrozkin li her çar parçane
Her hebêhêzalehengberzane
Her hebê têkoşîna xortane
Avakin dilêriyake çane

# Ferhengoka Degnê Kurd

| | |
|---|---|
| Alavsazî | : آلية عمل |
| Gelemperî | : عمومي |
| Petegar | : وثائقي |
| Şêwekar | فنان تشكيلي |
| Keval | : لوحة |
| Şakar | : عمل مبدع |
| Rûberûbûn | : مواجهة |
| Qelafet | : حجم |
| Rûdêm | : ملامح |
| Rexêz | : سحنة |
| Awat | : أمل |
| Navtêdan | : تشجيع |
| Pêkdadan | : مناوشة |
| Mezindegîr | : قيمومي |
| Pîşesaz | : مهني |
| Keşûseqa | : جو - مناخ |
| Birayane | : أخوي |
| Pevxistin | : تكوين - تشكيل |
| Pabend | : ملتزم |
| Hêma | : رمز |
| Gulok | : أيقونة |
| Taybetnazî | : خصوصية |
| Hilêb | : حساب سياسي |
| Pêşrewxwazî | : اقتداء- قدوة |
| Pêşrewxwaz | : المقتدى |

# Komeleya Sobarto
# Kongireyê diwemên lidarxist

Dendê Kurd

Roja 5 /7/2013 Tîrmehê li bajarê Qamişlo Komeleya Sobarto Kongiryê xwey diwemîn lidarxist, ev Komeleya ko giringyê dide dîrok û keleprê Kurdî, gelek ji endamên evê Komeleyê nedikarî bûn amade bibin ji ber kawdanê ewlekariyê .. lê be gelemperî komele gihişt nexweşbûne
Çendîn biryarin berbiçav , hêjayi gotinêye ko karûbarên komeleyê radibin li ser evan alavsaziyan ( korbendên hevpeyvînî - kornameyan - filmên peteyarî - seyranên Zanistî - pêşngehan ).









# di Şêwekariyê de li asmanê afrandinê ye

Enûd Hesen

Dendê Kurd

Roja 5 /7/2013 Tîrmehê li bajarê Qamişlo Komeleya Sobarto Kongiryê xwey diwemîn lidarxist, ev Komeleya ko giringyê dide dîrok û keleprê Kurdî, gelek ji endamên evê Komeleyê nedikarî bûn amade bibin ji ber kawdanê ewlekariyê .. lê be gelemperî komele gihişt nexweşbûne
Çendîn biryarin berbiçav , hêjayi gotinêye ko karûbarên komeleyê radibin li ser evan alavsaziyan ( korbendên hevpeyvînî - kornameyan - filmên peteyarî - seyranên Zanistî - pêşngehan ).





